

Dahûrandina Hevokê

Mihemed ELÎ

efrin2612@hotmail.com

Ez vexwandina sînemayê ji **bavê** xwe/min re **dişînim**

I. **Ez**: bernav.(cînav) Eng. pronoun

II.vexwandina sînemayê: biresera rasterast. Eng. indirect object

IV. ji... re: daçekên dativê ne. Eng. dative preposition

V. **bav**: biresera rasterast. Eng. direct object

VI. **ê** xwe : rewşa îdafeyê. Eng. genitive case

VII. **dişînim**: lêker



Me li jor ev hevok ji hêla rêzimanî ve dahûrand û delameta her hêmanekî ji şeş hêmanên, ku wê pêk tînin, raber kir. Îcar em têkevin nav şîrovekirina vê dahûrandinê.

- Ez: di rewşa kirdenav de ye (Causus rectus), ji lewre ew nayê tewandin û di rewşa asan de dimîne. Ez, li vir kirde (subject) dinimîne.

- Vexwandina **a** sînemayê: biwêjeke hevedudanî ye û di rewşa îdafeyê (genitive case) de ye. Îdafa di Kurdî de têkîliyê di navbera du tiştan de raber dike, ango arizî (possession). Rêbaza avakirina wê jî pir asan e, tenê tîpa (qertafa) **ê** tê dawîya navdêr an jî tiştê yekemîn (المضاف) , heke nêr be, û **a** heke mê be. Tişt an jî navdêrê duwemîn (المضاف إليه) heke mê be **ê** tê dawîya wî/wê, heke nêr be bê guhertin dimîne. Navdêrên raderîn (infinitve) hertim mê ne. Lewra em dibînin ku vexwendin tîpa **a** hatiye dawîya wê. Heke tiştê duwemîn cînav be ew (bi piranî) di rewşa tewandî de ye: *Gundê me*, Gund nêr e, ji lewre **ê** hatiye dawîya wî, tiştê duwemîn ji ber ku ne navdêr e, lê cînav e, ew hatiye tewandin! Herweha em nikarin bêjin, *gundê em!* Wek me amaje pê kiriye, heke tiştê duwemîn nêr û navdêr be, ew bê tewandin dimîne: *Deriyê hundir*, tevî ku terazî ew e ku navdêrê duwemîn heke nêr be jî were tewandin. Li hin deveran mirov tûşî *hevsarê hespê* an jî *hevsarê hêsp* tê, lê li hin deveran *hevsarê hesp* jî tê gotin, herwisa *tûrê nêr*, *tûrê nanî* û *tûrê nan*.

(Hin caran navdêr îdafeyî hem navdêr û hem jî rengdêr dibe. Di vê rewşê de, di navbera navdêrê duwemîn û rengdêr de qertafa îdafeyê ya navdêrê yekemîn xwe dubare dike. Gelo ev qertaf bi çi delametê radibe? Aya ew taybetmendiyê bilêvkirinê an jî rênivîsê dinimîne? Bi baweriya min herdu hêman xwe tê de dibînin: ji bo bilêvkirinê, bêyî ku ev qertaf were nivîsandin bilêvkirin hew asan e, W.M. *pirtûka min a nû*. Heke **a** nekeve navbera cînavka arziyê û rengdêr bilêvkirin zehmet dibe! Taybetmendiya din jî rênivîsî ye. Di mînak borî de pirtûk di rastiye de bi du birên qisetê yê cuda ve girêdayî ye, ango ew carekê îdafeyî ser

navdêrekî din dibe û cara din îdafeyî ser rengdêr dibe. Ji hêla sêmantîkê ve jî îdafeya ser cînavka arziyê û îdafeya ser rengdêr teqez cuda ne.)

- Daçekên dative¹ jî hertim duparçe ne, pêşdaçek û paşdaçek, ew xwe li biresera neraserast dipêçin. Ew jî hertim navdêrên mê di nav xwe de ditewînin û navdêrên nêr bi piranî bê guhertin dihêlin, hema bêjin wek rewşa îdafeyê ye! Lê di biwêja **ji bavê xwe/min re** de, ku hem rewşa dative û hem rewşa îdafeyê dinmîne, em dibînin ku tîpa **ê** li bav werda (zêde) bûye. Divê mirov ji xwe bipirse gelo ev **ê** biresera bav ditewîne an? Na, têkiliya vê **ê** bi tewandina bav re di rewşa dative de nîn e, ew bav di rewşa îdafeyê de ditewîne, ango têkiliyê di navbera tiştê yekemîn, ku nêr e, û tiştê duyemîn de xuya dike (di navbera bav û min de). **XWE/MIN!** Gelo çima mirov bi piranî 'xwe' ne şeweyê tewandî yê cînav 'min' bi kar neyîne? Bi baweriya me ev yek bi teşeyekî penî araste dike ku di tewandina tiştê duwemîn de di rewşa îdafeyê de, nelihevî heye (ev jî girêdayî peresîna dîrokî ya zimanê Kurdî tê re derbas bûye ye, û pêdivî bi lêkolîneke kûrtir heye).²

- Dişînim, lêkera vê hevokê ye, ku me hewl da em dahûrînin. Ew ji radera şandin tê dariştin. Di destpêkê de, em qurmê lêker bi raweya fermanî derdixin. Şandin→ **bi+şîn+ e**. Piştî ew di dema niho de wisa tê kişandin: **Ez di+şîn+im, tu di+şîn+i, ew di+şîn+e...**

1. Gelo cînavên dative di Almanî de ne çivandina daçekên duparçe yên Kurdî bin: ji min re →mir, ji te re→dir?

2. Berekajî Zimanê Almanî ku tiştê duwemîn mê be, natewe û nêr be dikeve ber veresê! Die Augen **der** Frau. Die Augen **des** Mannes.